# KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)

DESTÛRÎ KOMELEY XWÊNDKARANÎ KURD LE EWROPA
==========================================

1. Naw: Komeley xwêndkaranî Kurd le Ewropa

2. Amance binçîniyekanî:
   a) Be hêz kirdinî peywendî le nêwanî xwêndkaranî Kurd le Ewropa we hewl dan bo cêbecê kirdinî gîrû giriftî xwêndinyan.
   b) Hênane dî hawkarî maddî le nêwanî xwêndkaranî Kurda le Ewropa.
   c) Geşepêdanî zanistî niştimanî Kurd we hewil dan bo sûdî gelî Kurd û mesele niştimaniyekey.
   d) Nasandinî gelî Kurd û wulatekey (Kurdistan) û mesele niştimaniyekey be gelanî cîhan.
   e) Be hêz kirdinî giyanî hawkarî û dostayetî le nêwanî xwêndkaranî wulatanî ke da we peywendî bestîn legel rêkxirawanî xwêndkaran û ğeyrî xwêndkaran da le niştimanî û le cîhanî we hawkarî kirdin legelyana be pêy amane û çakey herdûla.
   f) Beşdar bûn le têkoşanî gelî Kurda we layengîrî têkoşanî hemû gelanî cîhan dijî împerîalîzm û koneperistî û rejîmî dîktatorî û le pênawî azadî û demokrasî û asayîş le cîhanda.

3. Komele govarêkî dewrî be nawî (Kurdistan) ewe der ekat ke ebête organî komele.

4. Endametî:
   a) Hemû xwêndkarekî Kurd ya danîştiwanî Kurdistan ke le Ewropa bixwênê etwanît bibêt be endam le komele da eger;
      I. Be destûrî komele qayîl bû we hewlîda bo hênanedî amancekanî.
      II. Abûney salaney (belay kêmewe sê pawendî Îngilîzî ya ewendey ew) bidat.
      III. Komîtey liq ya komîtey bereweberî giştî ebêt dilniya bin le bûnî mercekanî be bendî pesû le daxwazî endametîda.
   b) Eger endam be pêçewaney destûr cûlayewe yankarekî way kird ke ziyan be komele ya gelî Kurd bibexşêt xoy tûşî em sizayaney xwarewe ekat;
      I. Serinc rakêşan (înzar) emca serşikêne kirdin (tewbîx) be biryarî komîtey liq.
      II. Hel pesardin (tecmîd) be biryarî komîtey bereweberî giştî.
      III. Der kirdin be biryari kongrey gisti.

5. Rêkxistinî komele: Rêkxistinî komele le ser em bincîneyey xuwarewe ebêt;
   a) Kongrey giştî pêk dêt lew endamaney ke teyda amade ebin.
   b) Berztirîn deselat be destî Komele yewe boy heye deskarî destûrî komele bikat be kêmtirîn zorîney deng we le katî yek bûnî dengekan da ew laye ser ekewêt ke serokî kobûneweke layengîrî ekat.

PARTI KOMUNIST
www.arsivakurd.org

c) Salî carêk ebestrêt we le katî pêwistîda etwanrêt kongreykî nakaw bibestrêt leser dawa kirdinî be lay kêmewe 2/3 ey endamanî komele ya 2/3 endamanî komîtey bereweberî giştî we le herdû barekeda ebêt endamanî komele le şwênû katî kongre belay kêmewe mangêk lewew pêş agadar bikrên.

d) Tenya komîtey bereweberî giştî mafî dananî katû şwênî kongrey heye.

e) Pêş xwêndinî raporî KBG le endamanî kongre komîteyêk helebjerdrêt bo berêwe birdinî kobûnewekanî kongre.

6. <u>KBG (Komîtey Bereweberî Giştî)</u>

a) Berztirîn deselat be destî komeleye le nêwanî du kongreda.

b) Pêk dêt le hewt endam û du endamî cêgir ke le layen kongrey gişti-yewe hele-bjerdrên.

c) Pêş kongre û paş kongre ko ebêtewe we le yekem kobûneweyda le paş kongre le nêwanî endamakanya sekretarîat le sê endam we ejmêrî giştî û sekretêrî nûsînî govarî Kurdistan helebjerdrêt.

Sekretarîat biryarekanî KBG lenêwanî dû kobûneweda cêbecê ekat we be lay kêmewe her sê mang Carêk ko ebetêwe.

d) KBG programî kongre amade ekat we le yekem kobûnewey kongreda eyxate pêş çawaî endamekanî.

e) KBG le nêwanî du kongreda belay kêmewe carêk ko ebêtewe.

f) KBG rastewxo ber pirsyare beramber be kongrey giştî.

7. <u>LÎQ</u>

a) Pêk dêt le endamanî komele le wûlatêk da we be biryarî KBG dae-mezrê.

b) Berztirîn deselat be destî nawçekeye we belay kêmewe salê carêk ko ebetewe.

c) Le kobûnewey salaneyda endamanî komîtey liq helebjerêt..

8. <u>Komîtey Liq</u>.

a) Le sê ta hewt endam pêk dêt.

b) Karûbarî liq ebat berêwe we dewrekî balay ebêt le hênane dî amancekanî komele da we cêbecê kirdnî biryarekanî lew wûlateda ke karî têda ekat be mercêk le siyasetî KBG derneçêt.

9. <u>Derametî Komele</u>.

a) Derametî komele le maney xwarew pêk dêt;
I. Abûney salane.
II. Barbûy endamanû dostanî komele.
III. Destkestî çalakiyekanî komele.

b) Derametî komele le nêwanî qasey liq û qasey giştîda bem core dabeş ekrêt.

Qasey liqekan belay kêmewe 50 % î destkewtyan eden be qasey giştî beramber beme qasey liqekan etwanin be pey pêwistî le qasey giştî yarmateî dawa biken.

Sekretarîat
Stockholm 1/8/1970

www.arsivakurd.org